



Komalên Jinên Kurdistan

BERXWEDANIYA JINÊ, RÊ LI BER AZADIYÊ VEDIKE!

JI JINÊN CIHANÊ, XWIŞKÊN ME Û RÊHEVALÊN ME RE!

Ji çiyayên Kurdistanê ku li ser erdnigariyê wê bêriya bi hezaran salan di pêşengiya jinan de cara yekem civakîbûn çêbû û tovên çanda jiyana hevbeş hat avêtin, em we bi hezkirinê hembêz dikin û bi eşqê xwe yê jiyana azad û tekoşîna me yê bêhempa we silav dikin. Niha dema ku em 8ê Adarê nû pêşwazî dikin, di hemû dîrokê pergala baviksalarî de, hemû jinên ku hatine kolekirin, mêtînkirin û tunekirin lê li hemberê vê tiştê jî ji bo azadî û wekheviyê têkoşîn daye meşandin, bîranîna wan hêza bingehîn ê çavkaniya berxwedaniyê me ye. Li çar aliyên cihanê ji hemû jinên ku li hemberî serdestiya zilam, dagirkerî, hilweşandinê, kolekirinê re dengê xwe bilind dikin û berxwe didin, em silavên xwe yê dil û can rê dikin.

Li hemberî hemû hewldanên bêhafiza kirin û bêdîrokî kirin ê pergala serdest, em pir baş dizanin ku wekî jinan em xwedî dîroka berxwedaniyê mirovahiyê ye herî dirêj, herî kevn û herî bingehîn e. Em careke din hemû jinên zana û berxwedêr ku di vê pêvajoya berxwedaniyê daîmî de li hemberî pergala desthilatdar, baviksalarî, zayendperestî û dijminê jinan canê xwe dane, bi wesîleya 8ê Adarê bibîr tînin. Têkoşerên pêşeng ên Tevgerê Azadiya Jinê ku bi dehan şehîd daye, em Sakîne Cansiz, Zekiye Alkan, Gulnaz Karataş, Zeynep Kinaci, Sema Yuçe, Viyan Soran, Şîrîn Elemhulî, Şîlan Kobanê, Arîn Mîrkan û hemû şehîdên xwe bi hesret û hezkirinê bibîr tînin. Dîsa ji Rosa Luxemburg heta Clara Zetkîn, ji Haydee Santamaria heta Kittur Ranî, ji Şadiye Ebu Ghazaleh heta Nwanyeruwa, ji Mary Jones heta Doria Şefîk, ji Marî Beyleryan heta Louise Michel; em hemû jinên ku li ser tekoşîna gerdûnî yê azadiya jinê mohra xwe xistiye, bi qencî qala wan dikin. Bi taybet jî bi tekoşînên kedê û wekheviyê, di ragihandina 8ê Adarê de rol leyistine û ji bo vê armancê jinên kedkar ên ku ked û berdelan dane em dîsa bibîr tînin û hemû şopdarên wan silav dikin. Bîranîna wan ji dilê me re agir, ji mêjiyê me re ronahî û meşaleyek e ku tarîtiyê li ser me ferz kirî, parçe dike û riya me ronî dike.

Jinên Hêja;

Em di serdemekî de ne ku hemû nakokiyên di navbera ronahî û tarîfî, xweşikbûn û kirêtbûn, edalet û neheqî, azadî û koletî xwe herî zêde di dagirkeriyê li ser jinan de û li hemberî wê bilindkirina israra azadiyê de nîşan dike. Bi wê ve girêdayî, tu sedsal bi qasî sedsala 21êmin ji bo pêkanîna azadiya jin guncav nebûye. Ji ber vê em di nava serdemekî de ne ku potansiyel û dînamîkên şoreşa jin herî zêde bihêz e. Pergala serdest ji bo ku vê rastiye veşêre, bi hemû cure lîstok û êrîşan hewl dide lê belê wekî jinan, bi zanabûnê ve heqîqetê, bi zanabûna serdemê pêwîst e em nêzîkatiya xwe raber bikin û tekoşînê hembêz bikin. Ji ber ku ligel vê fersend û derfetên mezinkirinê destkeftiyên xwe, pergala desthilatdar û baviksalar ji bo astengkirina vê rastiye li her derê êrîşen xwe zêde dike.

Pergala desthilatdar û baviksalar ê 5 hezar salî ku dijî civakê ye, bi mezinkirin û belavkirinê dagirkeriyê hebûna xwe berdewam dike. Ji ber ku xwe spartiyê kara zêde. Şerên ku di cihanê de diqewimin, bi vê rastiye re girêdayî ye. Bi taybet jî armanca şerê parvekirinê sêyemîn ku di destpêkê sedsala 21emîn de bi mudaxaleyên Afganîstan û Iraqê destpêkir û di roja me de jî li Surî, Iraq û Kurdistanê kûr bûye, li ser esasê berjewendiyên hêzên desthilatdar ên cihanî de jinûve dîzaynkirinê erdnigariya Rojhilata Navîn e. Di heman demê de, şer û pevçûnên çekdarî ku li parzemîna Afrîkayê berdewam dike, girêdayî çavsoyîyê kara zêde yê moderniteya kapîtalîst û emperyalîzmê, tînan jiyanî. Ev çavsoyîyê kara zêde, ne tenê rê li ber şeran vedike, herwiha xwezaya me jî talan û tune dike. Dîsa li

Amerîkaya Latîn û Asyayê Rojhilat jî tunekirina daristanên hezaran salan, di pêvajoyekî ku xeteriyê ziwabûnê zêde ye jehrkirina çemên me, bi riya tûrbînên bayê ku li gundên me avakirine bi serde hewayê me jî kirine malê bazirganiyê û bi vî awayî tê mêtînkirin, vana hemû tenê dibin rehendekî qirkirinê avhewayê ku ji bo armanca kara zêde pêşdikeve. Em bênefes tên hiştin. Kevneşopiyên me yên bi hezaran salan, nasnameyên me yên çandî, pergâlên me yên civakî tên tunekirin. Di hemû qadên jiyânê de, di asta qirkirinê de, em bi êrîşên îmhakirinê re rûbirû ne. Dixwazin me bêhafiza bihêlin. Ji ber ku baş dizanin, yên ku hafizayê wan tune be, pêşerojê wan jî nîne. Bi vî awayî dixwazin me teslîm bigrin. Yên ku nikarin teslîm bigrin jî dikujin. Di roja me de şiddeta zilam, ji hemû şer û nexweşiyên zêdetir li ser jiyana jinan xeterî ye.

Lê belê li gel vê yekê, di roja me ya îro de qasî ku heta niha nebûye, ewqas jin di nava refên berxwedanê de cihê xwe digrin. Qasî ku hîç nehatiye dîtî, ewçend jin, îro ji bo azadiya xwe, ji bo vîna xwe, ji bo wekhevîya xwe tédikoşe. Qasî ku di tu demê dîrokê de nebûye, ewqas jin bi dengê bilind ji pergala dagirker ê baviksalarî re dibêje NA! Jin ji tevahî cureyên dagirkerî, komkujî, talan û mêtînkirinê re dengê xwe bilind dike û dibêje ÊDÎ BES E! Jin li dijî wana hemûyan derdikeve. Jin piştgiriya hev dikin, hevbeş dibin. Jin tédikoşe, xwe birêxistin dike. Jin berxwe dide. Bi milyonan li ser piyan in. Bi milyonan li kolanan, li meydanan, li çiyayan û li deştan in. Bi milyonan bi biryar in, natirsin, gava xwe paş de navêjin. Çi dibe bila bibe, dibêjin; em ê azadiya xwe bidest bixin, dawî li vê pergala mêtînger bînin, hemû zincîran bişkînin û serê xwe netewînin. Wekî Tevgera Azadiyê Jin ê Kurdistan, em bi coşekî şoreşgerî û ji dil û can, li hemberî pergala baviksalarî û sazûmanê wî yê mêtînger hemû berxwedaniyên jinan silav dikin.

Pêwîst e hûn bizanin ku li Kurdistanê li hemberî êrîşên rasterast û tund ên serdestiya zilam û faşîzmê tekoşîna azadiyê ku me mezin kiriye çawa ji berxwedaniyên we re hêz û îlham dide, her kîjan cihê dinyayê be bila bibe, dengê azadiyê jinê ku bilind dibe, li çiya û deştên Kurdistanê de dengvedide. Biqasî ku dengê me yê bilindbûyî li hemberî desthilatdarên zilamî dengvedide, pergala serdestiyê zilam ewqasî zêdetir diheje. Zemînê ku 5 hezar sal e li ser disekine, hîn zêdetir diqelişe. Dema qelşên wî kûr dibin, tirsê wî hîn mezintir dibe. Bila tirsê wî mezin bibe, bila hîn zêdetir bitirse! Ji ber ku em pir bibiryar in, em ê serdema xwe biguherînin serdema azadiya jinê. Ji ber ku tekoşîna me roj bi roj mezintir dibe, hîn bêhtir bihêz û bibandor dibe. Bila pergala baviksalarî bitirse, ji ber ku em pêşeroja azad ji niha de ava dikin! Li her derê! Li bostekî axê ku tav lê dide û tavahîv ronî dike, em ê jiyana azad lê ava bikin.

Rêhevalên Hêja!

Li çar aliyên cihanê, gelek tekoşîn tên meşandin. ku ji niha de encamên pir girîng bidestdixin, ji me hemûyan re moral didin, me bihêztir dikin û tirsê pergala baviksalarî mezintir dikin.

Li Amerîkaya Latîn, bi dirûşmê Ni Una Menos, yanî em ê jinekî din winda nekin, tekoşîna girseyî ku li hemberî qirkirina jinan berdewam dike, em silav dikin. Kuştina jinan, ne bûyerên yekjimarî ne û bingehe xwe ji dijminatîya jinan û zayendperestiyê civakî digire. Bona vê yekê, em pê bawer in, ji bo ku pêşî li qirkirina jinan bê girtin, bi mentalîteyê zilamperestî tekoşîneke bibandor pêwîst e. Bergiriyên zagonî girîng in lê herwiha tenê dikare bibe perçeyekî biçûk yê tekoşînê û rola xwe bileyize.

Em silavên xwe yên dilgerm ji bo xwişkên bi fularê kesk ên Arjantinê re dişînin. Ji axê heta kedê, hemû cureyên mêtîngerî û dagirkerî, destpêkê li ser bedena jin pêşketiye. Jin di dîrokê de, mêtîngeha yekemîn e. Ji lewre jî li ser bedena xwe, parastina vîna jinê bixwe ye, destnedayîni û xweseriya bedena jin qadeke bingehîn yê tekoşînê ye. Dema em mafê xwezayî ye jinan, mafê kûrtajê biparêzin jî, ji bo ku em bitevahî vê tekoşînê bidin meşandin û mafên zagonî bidest bixin jî pir girîng e ku em bi mentalîteyê ku jinê mêtînkirî dike re, şer bikin.

Rêhevalên me yên Zapafîst ku li daristanên Chiapasê hem li hemberî dewleta Meksîka û ji êrîşên kapîtalîzmê kûrewî re berxwe didin hem jî pergala xwe ya xweser û komînar ava dikin, îsal nikarin duyemîn Hevdîtina Jinên Berxwedêr lidarbixin. Em dixwazin ji wan re bêjin ku; Rêhevalno, bizanin ku agirê ku we pêxistiye, li Kurdistanê jî pêketî ye. Wekî ku agirê me dilên we germ û geş dike. Ji Zagrosan heta Sierra Madre, ji Feratê heta çemê Usumacinta, tekoşîna me yek e, berxwedaniya me tek e û gelên me xwişk û bira ne. Li hemberî arteşên dagirker, em di berxwedaniya we de bi we re ne, baweriya me têkûz e ku hûn ê vê berxwedaniyê qezenc bikin. Em we bi hezkirin, rêhevaltî û bibiratî silav dikin û dilgermî we hembêz dikin.

Ji Demavendê heta Hindukuşê, ji Gazzeyê heta qada Tahrîrê, em leşkerên bêtirs ên berxwedaniya bilindbûyî yê jinê bi rezdarî silav dikin. Li Iranê 40 sal e li hemberî şewazê herî tund ê mentalîteyê zilam berxwe dide û teslîm nabe, tevî hemû cure gefan û zextan, jinên berxwedêr yên ku dev ji azadiyê xwe bernade, em bang dikin ku em bi wan re di nava hevgirtinê de ne. Em bi jinên wêrek ên ku li Afganîstanê li dijî mudaxaleyên emperyalîst û çeteyên hevkar ên şer dengê xwe bilind dikin, li beranberê mentalîteyê paşverû ku jin wekî kirde nahesibîne berxwedanê radîkal birêxistin dikin, em bi we re ne. Em ji rêhevalên me yên Filîstînî yên re ku ji me re nîşan dan, heger bibe divê aşîti bi rûmet û heqanî be û li hemberî dagirkeriyê pêşengtiya berxwedaniyê axa xwe rizgarkirinê girtine li ser milên xwe, piştgirî didin. Em ji hemû jinên Êzîdî, Suryanî û Ereb ku pêşengtiyê berxwedanê li hemberî DAIŞê kirin û ji hemû jinan re nîşan dan ku parastina cewherî pêwîstiyêke çiqas girîng e, silav û rêzên şoreşgerî dişînin. Li Rojhilata Navîn, duyemîn şoreşa jin heqîqetek e û em hemû perçeyên vê heqîqetê pîroz in. Em hemû bi hev re, tarîtiyê ku li ser me tê fêzîkirin binbixin û axên xwe dîsa bikin welatê dayika xwedavend. Dengê şoreşa jin ji niha de bilind dibe, ji Rojavayê Kurdistan, belavî Rojhilata Navîn dibe. Di van rojên me de ku DAIŞ bi pêşengtiya jinan têk diçe, carekî din em dixwazin bala we bikşînin berxwedanê ku li Efrînê li hemberê çeteyên Islamî û artêşa Tirk a dagirker didome. Ji bo me Efrîn bajarekî jinan e û em ê tu carî vê bajarê ji çeteyên dijminê jinan re nehêlin. Salek berê, di 8ê Adarê par de çawa ku me got “em ê li Efrînê şoreşa jinê bipolarêzin”, îsal jî em ji hemû xwişkên xwe yên li cihanê bang dikin ku ji bo azadiya Efrînê, li dijî dagirkeriya Tirk dengê xwe bilind bikin. Dîsa heta rizgariya jin û zarokê dawî ji aliyê DAIŞê hatin esîrgirtin, em soz didin ku em ê tekoşîna xwe berdewam bikin. Em ê hesabê jinên Şengalî ku bûne sembola vîjdanê serdemê me, bipirsin. Ji fermanê re bersiva herî xurt, parastina cewherî û xweseriya demokratîk e ku di pêşengtiya jinan de pêşdikeve. Di heman demê de ev riya tekane ye ku dikare pêşî li fermanên nû bigire.

Em berxwedaniya bi dehan û dibe ku bi sedhezaran girtiyên siyasî yên jin ku ji ber tekoşîna azadiyê didin meşandin di nava çar diwarê de esîr tînin girtin, silav dikin. Hûn li hemberî hemû tehdoyên derûnî û fizîkî, ceza û tecrîdan, teslîmiyetê qebûl nakin û dibin pêşeng, ku zindanan dike qada berxwedanê. Bizanibin ku diwarên di navbera me de çiqas bilind û stûr bibin bila bibin, nikarin me ji hevdu qut bikin. Bi vê wesîleyê, bi taybet jî ji girtiyên siyasî yên jin ku di nava zindanan dewleta Tirk de li dijî tecrîdê di greva birçîbûnê de ne, em silavên xwe yên taybet dişînin, ji hemû jinên cihanê re bang dikin ku xwedî li çalakiya girtiyan derkevin û bibin dengê wan.

Di çend salên dawiyê de, greva jinan ê ku li hinek welatan de hat destpêkirin, îsal di 8ê Adarê de wê belavî cihên berfirehtir jî bibe. Bi taybetî jî li Almanyayê jinên ku îsal li dehan bajaran beşdarî grevê bibin, em bi coşekî mezin silav dikin, wana hembêz dikin. Pêwîst e em bizanibin ku, wekî jinan, ew hêza me heye ku em jiyane bidin sekinandin. Bes pêwîst e, em birexistinî bibin! Bendewariya jinên ku di nava hevgirtinê de ne, ew e ku destpêkê li Almaniya, li hemû cihên ku greva jin pêkwere, grubên herêmî yên ji hevdu qut in û perçe perçe ne, bi wesîleya 8ê Adarê bibin torekî û tifaqên mayînde pêşbixin. Pêwîst e em bi rojekî re sînardar nemînin û yekîtiya xwe domdar bikin, li ser vê esasê tekoşînên xwe hevpar bikin. Ev pêwîstî û armancek e ku serdema me li ser me ferz dike.

Li Amerîkayê jinên ku gotin wexta wî hatiye û zayendperestiya civakî di gelek qadên jiyane de aşkere kirin, bi kampanyayê #MeToo çanda destavêtin û destdirêjiyê pêşandan, heta Washingtonê meşiyar û ragihandin ku ew Trump wekî nûnerê xwe nasnakin, em wana silav dikin. Wekî din, em jinên reşîk ên berxwedêr ku li hemberî

nîjadperestî, cihêkarî û tundiyê dewletê tedikoşin, hembêz dikin. Em hevî dikin ku hûn ê mîrateya tekoşinê we ye 200 salî mezintir bikin û helwestê xwe biguherînin rexistinbûyînekî bihêztir.

Jinên Hêja,

Mîna gelek ji we dizanin, wek gel û tevgera azadiyê, li dijî faşîzmê Tirk, em di nava berxwedaniyêkî mezin de ne. Pêngava berxwedanê ku dirûşmê wî bi navê “Em ê tecrîdê bişkînin, faşîzmê hilweşînin û bi Rêber Apo re azad bijîn” e, di pêşengtiya jinan de dimeşe. Rêhevala me, hevseroka Kongreya Civaka Demokratîk û parlamentera HPDê Leyla Guven, di 7ê Mijdarê 2018'an de, di şert û mercên zindanê de dest bi greva birçîbûnê ya bêdem û bêdorveger kir. Di nava bi sedan Kurdên ku di şopa Leyla Guvenê de ketin greva birçîbûnê bêdem û bêdorveger, bi dehan jinên berxwedêr ên ku li zindanê ne jî hene. Daxwazê wan tenê ew e ku tecrîda li ser Rêberê me Abdullah Ocalan ku 20 sal e li girava Imraliyê dîl tê girtin, were rakirin. Lewre, Rêberê me Abdullah Ocalan di 15ê Sibatê 1999'an de bi awayekî korsanwarî û di çarçoveya operasyona NATOyê de ji Kenya'yê hat revandin û ji dewleta Tirk re hat radestkirin niha ji hemû mafên xwezayî muaf e, wekî ku ji meha Tîrmehê 2011'an ve hevdîtînin bi parêzeran re tê astengkirin û ji 5ê Avrelê 2015'an ve jî di nava tecrîdê girankirî de ye. Bi hiqûqî tu mafên wî nayê dayîn. Bi tenê serê xwe di hucreyêkî de tê girtin. Li girava Imraliyê kiryarên hiqûqî yên ji bo yek kesî taybet e, tê bicîhanîn. Dewleta Tirk zagonên xwe bixwe pêknayîne û pergalekî taybet ku hemû mafên mirovan ne derbasdar e, dide meşandin. Di serî de CPT ê ku girêdayî Konseya Ewropa ye û dewleta Tirk jî endamê wî ye, di ve mijarê de sazî û rêxistinên berpîrsiyar bêdeng dimînin û bi vî awayî pergala êsîrî û îşkenceyê dipejirînin.

Rêber Abdullah Ocalan, ne girtiyekî jirêzê ye. Ew rêberê gelek e ku navê wî jî hatiye qedexekirin. Ew, di salên 1970î de ji komekî xwendekaran re pêşengî kir û bi grubekî ciwanan re Partiya Karkerên Kurdistan PKKê ava kir, îro tevgera gelan ê ji milyonan pêktê afirand. Îro asta birdozî, polîtîk, parastin û rexistinbûyîna civakî yên jinên Kurd ku îlham dide û herkesî diheyirîne, rasterast encamê kedên Rêber Abdullah Ocalan e. Di nav şert û mercên tecrîdê girankirî de, paraznameyên ku ew nivîsandiye îro li çar aliyên cihanê de ji aliyê gelek tevgerên dij-pergal, gelên herêmî, rêxistinên jinan, partiyên çepger û sosyalîstan û hwd. ve bi kelecaneke tîn lekofînkirin, felsefeya azadiyê ku pêşxistiye û têgîn û têgehên demokrasîyê ji bo wan dibin mînak. Di şexsê rêberê me Abdullah Ocalan de, yê ku tê tecrît kirin, çareseriya demokratîk ê pîrsgirêka Kurd e, hevîyê aşîtiyê ye, jiyana hevbeş a gelan e û azadiya jinan e. Ji ber ku Rêber Abdullah Ocalan di bin tecrîtê de ye, li dewleta Tirkîye faşîzm bilind dibe, şer û pevçûn kûr dibe, netewperestî jinûve zindî dibe. Faşîzm, netewperestî, dijminatîyên civakî, şer û pevçûn, qeyranên aborî herî zêde bandora xwe li ser jin çêdikin.

Biqasî ku tu rêberê şoreşê nekiriye, ew dahûrandina zilamtî çêkir û tekoşîna azadiya jinê xistiye navenda şoraşa civakî. Di şexsê Rêber Abdullah Ocalan de yên ku tîn tecrît kirin, em in. Herî zêde, jin e. Bona vê yekê em dibêjin ku azadiya Rêber Abdullah Ocalan, azadiya me ye. Ji ber vê sedemê, em di nav çalakiyan de ne û em pêşengtiya berxwedaniyê digrin li ser milên xwe. Ji ber ku eger ew azad bibe, em jî azad bibin. Ger ku em berxwedaniyê mezin bikin, wê tecrît ji holê rabe, faşîzm têk biçe, Kurdistan azad bibe. Bendewariyê me ji we, ev e ku hûn jî ji bo vê berxwedaniyê de piştgiriya xwe nîşan bikin, deng bidin dengê me û bi me re li hemberê faşîzma Tirk berxwe bidin!

Îro, ji bo faşîzmê ku rejîma Erdogan nûnertiya wê dike, bidin sekinandin, pêwîst e em bibin yek. Ku faşîzm herî zêde êrîşî jinan û destkeftiyên wan dike û rolên kevneşopiyê paşverû li ser ferzdikeye. Wekî ku em vê tiştê li Tirkîye dibînin, li Brezîlyayê di şexsê Bolsonaro, li Fîlîpînlerê di şexsê Duterte, heya li Rusyayê di şexse Pufîn û li Amerîkayê di şexsê Trumpê de jî dikarin bibînin. Taybetmendiya bingehînê faşîzm ew e ku dijminê jin e. Lewma, herî zêde ji berxwedaniyê birêxistinî yên jinan ditirse. Wek Tevgera Azadiyê Jin ê Kurdistan, em tînin ziman ku, li dijî desthilatdarên populist-faşîst ku li ser jiyana me hereşeyekî bingehîn e, em berxwedaniyên xwe hevbeş bikin û wana bikin yek. Li hemberî faşîzmê, dem dema avakirina eniya berxwedaniya jin e! Dem dema yekbûn, destê hev girtin û bi vî awayî li pêşîya faşîzmê girtin e! Em dikarin. Bi vê rihê berxwedanê li Bakurê Kurdistan û Tirkîye, heger

jin li hemberî faşîzmê tekoşîna hevbeş bilind bikin, teqez dê faşîzma AKP-MHPê hilweşe. Wekî xwişkên me yên ji Tirkîye jî dibêjin, Em bi hev re bi hêz in! Em serê xwe natewînin û ji faşîzmê re rê nadin!

Rêhevalno!

Li her derê, em dibin şahîdê mezinbûna zanistiya jin, çalakiyên dijderketinê jinan. Jin li hemberê çanda destdirêjî û destavêtin, cihêkarî, mêtînkirin, dagirkirin, newekhevî, qetlîam, şiddet û cînsîyetparêzî disekine, protesto dike, berxwe dide. Jin daxwazên xwe û jiyaneke çawa dixwaze bi dengekî bilind tîne ziman. Potansiyela çalakiyên jinê, gihîşt astekî pir girîng. Em xwedî hêzê ewqasî mezin in ku di demekî pir kurt de dikarin bi sedan, bi milyonan însan derxin kolanan. Hêjmara me roj bi roj zêde dibe. Roj bi roj em mezintir dibin. Em bi reng in, aktîf in, bi biryar in, xwedî armanc in û bihêz in!

Niha tiştê girîng ew e ku em ê berxwedaniya xwe zêdetir birêxistinî bikin û bi vî awayî hêza guhertinê derxin holê. Pêwîst e pir baş bê zanîn ku rêxistinbûyîna yekemîn rêgeza berxwedaniyê azadiya jin e. Rêxistinbûyîn nebe, azadî jî ne pêkan e. Ligel vê yekê pêwîst e, em protestoyên ku çêdibin, biguherînin rêxistinbûyînen mayînde. Şert û mercên di yekemîn çaryeke sedsala 21emîn de û sekna jinan ne tenê li hember sekinandinê, di heman demê de ji bo avakirina jiyana azad jî guncaw e. Ango êdî em dikarin asta tekoşîna xwe bilind bikin. Dijderketina xwe birêxistinî bikin, li dijî pergala antidemokratîk, zordar û li ser serdestiya zilam, tekoşîna xwe zêdetir bitevahî û hevpar bidin meşandin. Lewre, dema ku tekoşîna me perçe perçe dimîne û hevdu temam nake, em nikarin qasî ku tê xwestin bibin hêza guhertinê. Lêbelê, dem dema pêkanîna şoreşa jinê ye, dema sedsala 21emîn guhertinê serdema azadiya jinê ye. Şert û mercên wê, ji her demê zêdetir guncaw in. Wek Tevgera Azadiyê Jin ê Kurdistan, em ji bo hemû tekoşînen jinan ku di asta kûrewî de tîne meşandin, bikin hevpar pêşniyara xwe wekî Konfederalîzma Jinên Cihanê bi nav dikin. Bêyî wekehevkirin em ê hevpar bikin, xweseriyê biparêzin û bi vî awayî armanc dikin ku yekitiyê tekoşîna jinan pêş bixin. Wek tevger û rêxistinên jinan, pêwîst e em perçebûyîn û qutbûyîne di navbera me de derbas bikin û helwestên hevbeş pêşbixin, taktîk û stratejiyên hevpar diyar bikin, di çalakiyan de jî yek bibin û pergalên hevkar ava bikin. Bona vê yekê, pêdiviya me heye ku em bi hev re rêgez û ferasetên pêwîst ê rêxistinbûyîne nîqaş bikin û biryaran bigirin. Hevpeymanî Cîvakî yê ku wek tevger di sala 2002'an de me ragihand û di van rojan de dîsa li ser dixebitin, ji bo vê armanca dikare bibe çarçoveyeke bingehîn.

Jinên berxwedêr,

Rihê serdemê me ji me re fermana bilindkirina tekoşîna azadiyê dide. Mîna ku em dikarin serdema xwe biguherînin çaxa azadiya jinê, ev di heman demê de ji bo me pêwîstiyekî dîrokî ye. Werin em ji bo vê armancê bibin yek. Wek jinên cihanê rabin ser piyan. Em dibêjin ku berxwedaniya jinan rê li ber azadiyê vedike. Ku wisa be, em li derdora agirê berxwedaniyê de bigihîjin hevdu, destên yektir bigrin û govenda azadiyê bixşînin, agirê şoreşê geş bikin. Li hemberî dagirkeriyê, faşîzmê, mêtîngiriyê û bavîksalariyê em ê hemû rojan bikin 8ê Adarê û berxwedaniya xwe mayînde bikin. Va ye, wê demê dê jiyana biguhere. Hingê, dinya xweş bibe. Wê demê şoreş pêkwere. Em hemû bi hev re şoreşa jinê mezin bikin û pêşeroja xwe ava bikin!

Em ji faşîzmê re rê nadin!

Berxwedaniya jinan rê li ber azadiyê vedike!

Jin jiyana Azadî!

5'ê Adara 2019'an

Koordînasyona Komalên Jinên Kurdistanê - KJK